

	Çîv ji Martin Baltscheit übersetzt von Mahmut Aydın
	Çîv Çûkek ji hêlîna xwe dikeve xwarê. Çîv! Li ser gihê. Li tenîştê golê. Hema li kêleka beqan. Qwak! Beq dibêjin. Çîv! Çûk dibêje. Qwak! Qwak! Qwak! Çîv! Çîv! Çîv!
	Beq difikirin: Ew ji bo mêşekê mezin e. Ew ji bo leglegekê piçûk e. Çûk difikire: Ew ji bo kurmekî mezin in û ji bo dayikekê xirab distirên. Çûka piçûk nîşanê wan dide, ka ew çawa bi rêkûpêk tê kirin: Çîv! Lê beq wê fêr nakin. Qwak! Qwak! Qwak! <i>Û çûk beqan fêr nake. Çîv! Çîv! Çîv!</i>
	Paşê çûk tiştêkî dîntiyê dike. Qwak! Û beq bêdeng dimînin. Wan berê beqek wisa qet nedîtine. Heta beqek wisa jî tune ye. Paşê yek ji beqan hinekî dîntiyê dike: Çîv! Û beqên din jî tevî dibin: Çîv! Çîv! Û çûk diqîre: Qwak! Qwak! Û beq distrên: Çîv! Çîv! Çîv! Û çûk diqîre: Qwak! Qwak! Qwak! Qwak!
	Legleg hemû tevliheviya dengên dibihîze. Bi lêdana baskên fireh, bi zikê birçî dadikeve ser erdê. Lê beq wek çûkan distirên. Û çûk wek beqekê diwaqe. Legleg ji vê cihanê fam nake û ji wir difire. Niha beq kêfxweş dibin. Ji îro û pê ve, dema ku legleg tê, ew ê bistrên. Çîv! Çîv! Çîv! Û ew ê ji beqên din re bibêjin. Çîv! Çîv! Çîv! Û wiha hemû hildipekin.



Çûka biçûk bi tena serê xwe li ser giha dimînê. Qwak!

Dar bi pelan tijî ye. Sî bi giha tijî ye.

Di nav gihê de tiştê diqewime.

Xiş. Xiş. Fişk. Kûçikek li tiştên kêrhatî digere.

Qwak! Dibêje çûk. Wauw! Dibêje kûçik.

Û ew ne hewceyî çûkbeqê ye. Fişk. Fişk. Xişk. Xişk... Ew çûye.



Çûkek piçûk dikare bi rastî baş kêrî pisîkê were.

Ji bo lîstinê: Goga avêtinê, balîfa lêdanê, kîsikê paçikan.

Pisîk jî ji hoqebaziyê hez dikin. Bi du, sê, an çar pençeyên xwe. Gava ku ew ji lîstinê têr dibin, ew dixwazin bixwin û pençeyên xwe tê re derbas bikin.

Wauw! Çûka biçûk dibêje.

Myaw! Pisîk diqîre û bazdide ser darê.

Wauw! Çûk dîsa dibêje û diranên xwe nîşan dide.

Wauw! Wauw! Wauw!



Paşê werdek û qû ji wir bazdidin û hemû jûjî xwe ditelînin. Tenê yek kokelek li pey armanca xwe diçe. Hêdî hêdî.

Çûka piçûk bi wan re xwediyê heman raman e: Bijî û bihêle bijîn.



Qî qîrî qîrî! Kesek ji bo alîkariyê gazî dike. Qî qîrî qîrî! Ev dengê tengasiyeke mezin e.

Çûk direve. Ew difire. (Hema bêje.) Qî qîrî qîrî!

Dîk li ser qûça zibilê radiweste û serê wî dişewite - bi awayekî.

Çîv! Çîv! Çîv!

Dîk dikene. Çîv! Çîv! Çîv!

Pûrta xwe ya sor şeh dike û dadikeve xwarê. Çîv, çîv, çîv...

Ma ev zimanek e?

Qî qîrî qîrî!!! Piştîre diçe taştê bixwe.

	Roj wek dayikekê germ dike. Çûka piçûk nizane biçe ku derê. Ew qet carekê nehatiye vir. Cihan bi tiştên qet nebûyî tije ye. Qwak! Çûk dibêje. Wauw! Û: Myauw. Dema ku kes nayê, herwiha ew diqîre: Qî qîrî qîrî! Lê cihan bêreng e. Ezman bi ewran dagirtî ye. Erd bê heval e. Qwak! Wauw! Myauw! Qwak! Wauw! Myauw! Qwak! Wauw! Myauw!
	Kerek vê yekê dibihîze. Û pê hewes dike. Ker tenê zimanekî dizane. Û di wî de, tenê bi yek peyvê diaxive: Aî aî! Çûk dengê kerê dibihîze. A - î! Ew ajalê xerîb dibîne û çavên wê dipirsin: Tu dikarî alîkariya min bikî? A - î! Ker dizire. Tu dizanî ez li ku dijîm? A - î! Ker dizire. Û ez dikarim bi te re werim?
	Çûka biçûk li pey wî diçe. Û ker ji vê yekê kêfxweş dibe. Ew ji zimanên biyanî hez dike. Çîv. Çîv. Wauw. Wauw. A - î! Çîv. Çîv. Wauw. Wauw. Tirîlî! Tirîla! Çûka piçûk radiweste. Ker jî wisa dike. Piştî çûkek din gazî dike! Li jêr li kêleka golê. Hema li kêleka beqan. Gelo ew ê kî be?
	"Wauw"
	Dawî